



Damezirandina rêxistinekê jibo koçberan Jugendliche ohne Grenzen NRW & Flüchtlingsrat NRW

Di dinyaya îroyîn da bi awayê berdewam li warê koçberî û penabertiyê behs tê kirin. Pirraniya xelkê li bara koçberiyê diaxivin, lê bi wan bi xwe ra napeyivin. Saziyên xwerêvebir ên koçberiyê dixwazin ku vê rewşê biguherînin û vê îmkanê jibo koçberan dabîn bikin ta ku nêrînên xwe bînin zimên û hin zanyariyan bi awayê giştî li bara siyaseta penabertî û egerên revînê hilêxînin. Ev lîsteya kiryanan ji aliyê Saziya Ciwanên Sînornenas va hatiye amadekirin, ku bi salan e li warê xurtkirina cîgeha penaberan li jiyana gelemperî dixebite. Bi vî awayî ev lîsteya kiryanan pirranî bi armanca çalakiya siyasî ye.

Berî damezirandinê

Ji hêla me va, girîng e ku engîze û armanca damezirandinê ji nava penaberan bi xwe û bêyî ku kesên xwebexş destpêkerên wê bin, peyda bibe. Ji bilî viya nixandineke herêmî ya seretayî li bara rewşa penaberan gellek girîng e.

- Çi hejmara penaberan hatine şûndayîn û şûndayîna bo wan çawa bûye?
- Çi kes berpîrsê bicihkirin û amadekariyên wan e?
- Ewna ji çi welatan tên?
- Jibo peywendîgirtina digel wan hewcetî bi çi zimanan heye?

Amadetiya jibo civîna damezirandinê

- Ode: Ewna gere ku ji hêla siyasî va bêalî bin û li navendê bin.
- Amadetiya jibo vexwendinê: Piştgiriya ji penaberan dikare ji riya kesên xwebexş va pêk were. Tevî viya çalakiya kesên xwebexş heta ku pêkan e, kêmbê.
- Penaber: Parvekirina vexwendinnameyan (bi zimanên pêwîst) bi şekla broşoran li ciyê mayînê; Li pêvajoya parvekirinê, kesên ku parve dikin gere ku hemî zimanên pêwîst bi kar bînin. Heke dîsan jî pîrsên bersivnedayî hebin, dêvê ku rasterast werin şirovekirin.
- Kesên xwebexş: parvekirina vexwendinnameyan bi forma Broşorê li dibistan, navenda taybetî ciwanan, lijneyên rehetiyê, klîse û hwd. Ji bilî viya reklama ji riya mêdyayên herîmî mîna rojname û radyoan.

Lidarxistina civîna damezirandinê:

- Nasnadina kesên amade li civînê
- Berhevkirina zanyariyên peywendîgirtinê ji riya lîsteya beşdaran
- Girtina wêneyan bi îzna beşdaran
- Vegotina pîrsgirêkên herêmî û berbendên li ser riya kesên hazir li civînê
- Gotina egerên van pîrsgirêk û berbendan jibo kesên amade li civînê
- Berhevkirina îde û hin nêrîn û bîr û rayan jibo çareserkirina van pîrsgirêkan
- Diyarkirina erk û berpîrsiyariyan
- Çêkirina bangewaziyên nivîskî (Mîna E-Mail, facebook û WhatsApp`ê)
- Lihevkirina li bara civînên pêşerojê jibo şopandinê (Pêşniyar tê kirin ku di heman roja hefteyê da û di heman saetê da be)





Ev damezirandin serketinek e – Niha em çi bikin?

Piştî civînê, engîzeyê hemî beşdarên dê gellek zêde be. Biakranîna durust a vê vîn û engîzeyê û destpêkirina lezgîn a xebatê ji roja piştî civîna damezirandinê, mijareke gellek girîng e. Ji bilî viya dê ev vîn û engîze ji nav here û dê bêhêvîti dewsa wê rûne. Ji ber viya saziya Ciwanên Sînornenas, xalên jêr ji we ra vedibêje:

- Rapora çapemeniyê ya damezirandinê ji riya rojnameyekê biweşînin û ji vê rêkê va kesên ku meraq dikin, vexwînin
- Digel berpîrsên çiyê mayînê peywendiyê bigirin
- Torek ji saziyên hawargihan, navend, lijneyên rehetiyê, komên dijî faşîzmê û hwd damezirînin.
- Kempêynan cih bînin

Çi cûre kempêynan?

Armanç û liv û tevgerên kempêynan gere li bara pîrsgirêkên penaberan di asta herêmî da bin. Divê hewil were dayîn ku agahî li bara pîrsgirêk û berbendên ser riya penaberan zêde bibe û rêkarek jîbo wan peyda bibe.

Girîng: gellek ji berbend û pîrsgirêkan tenê têkildarî asta herêmî nînin, belki di asta federal û neteweyî da jî hene. Li pîrriya babetan pîrsgirêkên viha nikarin bi awayê herêmî çareser bibin, belki gere agahiya li ser wan zêde bibe.

Hin mînakên kempêynan

- Xwenîşandan
- Trîbona Azad (penaber û kesên din dikarin pîrsgirêkên xwe bînin zimên)
- Weşandina nerezamendiyê li çapemeniyên herêmî
- Cejnên mezhebî (Krîsmes, Rojî (Remezani) û gellek babetên din) û ne mezhebî
- Hevdîtina digel berpîrsên bajêr
- Amadekirin û parvekirina hin bangewazî û broşoran li warê siyasetên penabertiyê û egerên revîna mirovan
- Lidarxistina sêminar û komxebatan li dibistan û zanîngehan

Zanyariyên peywendîgirtinê

Jugendliche ohne Grenzen NRW

Bintou, Landeskoordinatorin von JoG NRW:
Tel.: 0174 9381668

ehrenamtlicher Unterstützer von JoG NRW:
Tel.: 0157 55583395

E-Mail: presse@jogspace.net
www.jogspace.net

facebook.com/JoGNRW

Flüchtlingsrat NRW

Geschäftsstelle Flüchtlingsrat Nordrhein-Westfalen e. V.
Wittener Straße 201
44803 Bochum

Tel: 0234 587315 6

Fax: 0234 587315 75

Montag bis Freitag 10 - 16 Uhr

E-Mail: info@frnrw.de

www.frnrw.de

Saziya Ciwanên Sînornenas NRW amade ye ku bersiva pîrsên we bide!
